HAUS DER SPRACHMITTLUNG

# Agahiyên ji bo muşteriyan derbarê axaftinên bi navbeynkarên ziman re

Navbeynkarekî/e ziman dê di hevpeyvîna ligel pisporekî/ê de li ba we be. Pispor ew kes e ku hevpeyvînê bi rê ve dibe. Navbeynkarê/a ziman her tiştê ku tê gotin şîrove dike. Ev tê vê wateyê ku ew her tiştê ku hûn dibêjin werdigerîne almanî. Û her tiştê ku pispor dibêje werdigerîne zimanê we.

Li vir hûn ê agahiyên ji bo hevpeyvînê giring bi dest bixin:

## Navbeynkarê/a ziman

- nepen e ango ti agahiya li ser we û derbarê naveroka hevpeyvînê de nagihîne kesên din.
- ji her kesê/a di hevpeyvînê de berpirsiyar e: ji we û ji pispor.
- bêalî ye ango pêşniyazan li kesî nake û piştgiriyê nade kesî.
- her tiştê ku ji hêla we û pispor ve tê gotin şîrove dike.

## Hevpeyvîn

- Hêdî û bi zelalî bipeyivin.
- hevokên kurt û fambar saz bikin.
- Piştî du hevokan navberê bidin axaftinê da ku navbeynkar gotinên we wergerîne.
- Heke navbeynkar gotina we ji bo wergerê bibire, ji kerema xwe vê yekê bi xweşbînî pêşwazî bikin.

## Pispor

- şirîkê/a we yê/ya hevpeyvînê ye.
- divê piştrast be ku we her tişt fêm kiriye.
- pirsên we dibersivîne.

Her dem rasterast bi pispor re bipeyivin û di dema axaftinê de lê binêrin.

Mala Navbeynkariya Ziman ji we re hevpeyvîneke serkeftî dixwaze!

i

Derbarê navbeynkariya ziman de pirs an fikarên we hene?
Ji vê navnîşanê ji me re binivîsin: info@haus-der-sprachmittlung.de
û bibin aboneyê/a bultename!



Im Auftrag von:

Arbeit und Leben
RHEINLAND-PFALZ / SAARLAND

RheinlandPfalz
MINISTERIUM FÜR FAMILIE, FRAUEN, KULTUR UND INTEGRATION